Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1290 16-Tirmeh-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# ‘Ez, Şehrîbana Kurdî û hin hunermendên din dê werin Rojava’

Hemza Sêvo/ Qamişlo

**Rapçiyê Kurd Şerîf Omerî eşkere ku ew ê ji bo konserta salvegera Şoreşa 19’ê Tîrmehê were Rojava û got, “Ez û Şehrîbana Kurdî û hin hunermendên din ji aliyê Desteya Çand û Hunerê ve ji bo lidarxistin koneserta salvegera şoreşê hatine vexwendin.”**

19’ê Tîrmehê Salvegera Şoreşa Rojava ya 13’an e, ji bo vê boneyê wê li tevahiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê şahî û çalakî bên lidarxistin. Yek ji wan jî şahiya ku wê di 19’ê Tîrmehê de, li Parka Azadî ya bajarê Qamişlo bi amadebûna hunermendên Kurdistanî li dar bikeve. Ji van hunermendan Şerîf Omerî yê ku ji bajarê Qamişlo ye. Şerîf Omerî li Almaniyayê dijî û wê ji bo şahiyê serdana Rojava bike. Şerîf Omerî derbarê hatina xwe ji bo Rojava ji rojanmeya me re axivî.

**‘Ez ê tevlî konserta salvegera Şoreşa Rojava bibim’**

Omerî diyar kir ku wê ew û çend hunermendên din tevlî konserta salvegera şoreşê bibin û wiha got: “Cara duyem e ku ez ê 18’ê vê mehê derbasî Rojavayê Kurdistanê bibim. Wekî em dizanin di destpêka sala 2025’an de min serdana Rojava kir, lê serdana min tenê ji bo malbatê bû. Ev car wê bi awayekî fermî serdan çêbibe, ji ber ku Desteya Çand û Hunerê ez û çend hunermendên din weke Şehrîbana Kurdî û hin hunermendên din vexwendiye şahiya salvegera Şoreşa Rojava. Ew ê hunermendên din jî ên navdar tevlî vê konsertê bibin, lê ne ji mafê min e ku ez navê wan bînim ser ziman. Di konsertê de ez ê strana xwe ya nû ku min li ser Bendava Tişrînê û Şehîd Bavê Teyar çêkiriye, bêjim. Li hêleke din gelek xebat li Rojava wê were kirin, ez ê serdana hemû navendên me yên girêdayî muzîk, çand, hunerê û hwd… bikim. Min gelek suprayz amade kirine, dibe ku kilîpeke nû jî li Rojava çêkim, ev yek jî li gorî derfet û demê dimîne.”



**‘Hestekî xweş bû ku ez şervanên Kurd bibînim’**

Şerîf diyar kir ku dema yekem car hat Rojava ew gelekî kêfxweş bû dema şervanên Kurdan dît û wiha domand: “Di destpêka aloziya Sûriyê de ji ber bêarambûna rewşa herêmê ez ber bi Ewropayê ve koçber bûm. Li Ewropayê ez fêrî ziman, çand û kultûreke nû bûm, herwiha ez fêrî tiştên nû bûm, hem jî min berhemên nû çêkirin, stran û muzîka xwe li pêş xist. Eger li Rojava min jiyana xwe domandiba dibe ku ev pêşketin pêk nehatiba, ez di warê aborî de jî gelekî hewcedar bûm ku koçber bibim, wekî em dizanin ji bo pêşxistina hunerê, afrandina kilîpan û hwd… hêzeke aborî ya mezin pêwîst e. Dema ku ez cara yekem, daketim Rojava ez gelekî dilxweş bûm, bi taybet dema ku min şervanên Kurd dîtin ku çawa parastina gel dikin û çawa rêvebirina herêmê di destê gelê Kurd de ye. Bajarê min weke xwe mabû, lê belê hin guhertin li Qamişlo çêbûbû, cîranên taxa min jî hatibûn guhertin, lê Qamişlo ew Qamişlo bû. Ez di wê baweriyê de me ku wê Qamişlo li pêş bikeve û wê Şoreşa Rojava bi ser bikeve.”

**‘Gelê li Rojava bi coşeke mezin li benda min in’**

Rapçiyê Kurd Şerîf Omerî anî ziman ku gelê Kurd li Rojava bi coşeke mezin li benda wî ye û wiha axivî: “Dema ku ez bighêjim ser sînor wê gelek dost, şopîner, hevalên min, rojnamevan û hwd… bên pêşwaziya min bikin. Herwiha gelek kes li ser hemû bernameyên mediya dijîtal weke instigram, tîktok û fêcbookê têkilî bi min re kirine û dibêjin em bi coşeke mezin li benda te ne. Piştî zêdeyî 10 salan ku ez werim Rojava û konsertekê li bajarê xwe li dar bixim ji bo min cihê şanazî û kêfxweşiyê ye. Ez gelekî bi coş im ku şahiyekê bi gelek hunermendên din re ji bo salvegera Şoreşa Rojava li dar bixim, bi hêvî me ku konserteke bi dilê gelê Kurd be û ez li gorî baweriya gel bim.”

## FERHENGA BIWÊJAN

**Garisê hûr ji destê wî narije:**
- Pir çikûz e; kinoj e; xesîs e; pir tima ye.

**Gepên mêvanan dijimêre/gepan dijimêre:**
- Bi heman wateyê.

**Golikê paçxwer e:**
- Pir tima ye; pir xesîs e; ji xwe tenê re ye; kinoj e.

**Gora belaş bibîne wê xwe tê de dirêj bike:**
- Bi heman wateyê.

**Gunehê xwe jî nade mirov:**
- Bi heman wateyê.

**Heta mirinê çav li kirinê:**
- Insan ji malê dinyayê têr nabe. Ji bo mirovên tima tê gotin.

**Ji bêriyê tê ji min şîr dixwaze:**
- Derfetên wî ji yên min pirtir in, lê dîsa ji min dixwaze.

**Ji kîs xelkê merd e:**
- Bixwe mirovekî kinoj e, lê li ser hesabê xelê merdîtiyê dike.

**Ji libeke tirî mehserekê çêdike:**
- Pir kinoj e; çikûz e; destê wî girtî ye; tima ye; qenciya wî nagihe ti kesî.

**Ji mewîjekê kergekê dikelîne:**
- Bi heman wateyê.

**Kund e:**
- Çikûz e; ne merd e; destgirtî ye.

**Liba gir di qirikê de dimîne:**
- Ji bo kesê çikûz tê gotin.

**Libek kuncî ji destê wî narije:**
- Bi heman wateyê.

**Merdê ji kîs malê xelkê ye:**
- Bi heman wateyê

**Merdê ne bi malê xwe ye:**
- Bi heman wateyê.

**Mêşan didoşe:**
- Bi heman wateyê.

**Mirdo ji kîs min merdo:**
- Bi heman wateyê.

**Nanê deriyan ketiye zikê wî:**
- Çikûz e; zikê xwe li mala xelê tijî dike.

**Nan dixwe çavê pisîka xwe digire:**
- Pir çikûz e; pir kinoj e.

**Nanê wî li ser çoka wî ye:**
- Ne merd e; çikûz e; tima ye; xesîs e; ti caran qenciya wî nagihe ti kesî.

**Nan û xwêya wî li ser çoka wî ye:**
- Bi heman wateyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Bi kamîreya Ayşa Silêman



## ‘Berxwedana 14’ê Tîrmehê hîmê têkbirina faşîzmê ye’



Yek ji berxwedêrên girtîgehên dewleta Tirk Kamuran Efrîn da xuyakirin ku ruhê 14’ê Tîrmehê Şoreşa 19’ê Tîrmehê ava kir û wiha got: “Berxwedaniya bêhempa ya Rêber Apo li Girava Îmraliyê domandina berxwedana Xeyrî û Kemalan bû.”**R-5**

## Şoreşa Gelan

Pêkhateyên Kurd, Ereb, Suryan û Ermen diyar kirin ku Şoreşa 19’ê Tîrmehê ji her kesî re diyar kir ku dîrok nayê jibîrkirin û azadî ne xewnek e, lê mafekî şoreşgerî ye ku divê were desteserkirin û gotin “Ger şoreş bi destê gelan pêk nehatiba bi ser nediket.”**R-6**



## Herêmên Rêveberiya Xweser bûye qubleya ewle ya gelên Sûriyê



Hevserokê Ofîsa Têkiliyên Giştî ya PYD’ê Silêman Ereb da zanîn ku siyaseta qirkirinê û şerê mezhebî di Sûriyê de ne nû ye, hikumeta veguhêz a Şamê jî berdewamiya wê ye û got: “Gel gihişte wê baweriyê ku cihê herî bi ewle di Sûriyê de, Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye.”**R-4**

## Komîn yekem saziya rêxistinkirin û veguhartinê ye



Komîn bingeha rêxistinkirina civakê ye, şaneya herî biçûk a ku civakê li ser bingeha fikrê Rêber Apo ya ku xwe bi xwe bi rê ve dibe, hate afirandin. Jina ku xwe bi vê felsefeyê re gihandiye, di dendika vê şaneyê de rola pêşengtiyê digre.**R-2**

**Gelo Sûriyê careke din dê bikeve bin bandora rêjîmeke otorîter?**
Zekî Bedran R-5



**Dewra Nû**
Farûk Sakik R-5

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1290 16-Tîrmeh-2025 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# ‘BANGA RÊBER ABDULLAH OCALAN REFERANS E DOR A TIRKIYÊ YE’

Dektorê zanistên siyasî yê Misrî Taha Elî destnîşan kir ku bangên Rêber Abdullah Ocalan Referansa demokrasî û edaletê ye û got: “Êdî dora Tirkiyeyê ye, parlemento dikare rola xwe bilîze.**R-3**





## Şoreşa 19’ê Tîrmehê zimanê dayikê ji qirkirinê parast



Şoreşa Rojava ne tenê gelê Kurd ji qirkirinê parast, çand û hunera tevahiya gelên herêmê jî parast û pêş xist, bi taybetî zimanê dayikê, lewra ziman nasnameya civakê ye. Endama Saziya Zimanê Kurdî Delal El-Haşimî diyar kir ku bi saya şoreşê zimanê dayikê ji qirkirinê hat parastin.**R-7**

# Komîn yekem saziya rêxistinkirin û veguhartinê ye

Komîn bingeha rêxistinkirina civakê ye, şaneya herî biçûk a ku civakê li ser bingeha fikrê Rêber Apo ya ku xwe bi xwe bi rê ve dibe, hate afirandin. Jina ku xwe bi vê felsefeyê re gihandiye, di dendika vê şaneyê de rola pêşengtiyê digre.

**Navenda Nûçeyan**

Komîn saziyeke civakî, aborî, siyasî û xizmetguzariyê ye ku bi pergaleke demokratîk a komînal a li ser esasê demokrasiya rasterast, azadiya jinê û lihevhatina gelan a ji hemû kom û mezheban hatiye avakirin e. Komîn yekîneya civakî ya herî biçûk û bi bandor e; li ser esasê beşdariya rasterast a li gund û taxan hatiye avakirin. Komîn naverok û bingeha rêxistinê ye, li gorî şert û mercên civakî li gund, tax, bajarok û bajaran xwe bi rêxistin dike.

Bi şoreşa 19'ê Tîrmehê û bi hêza gel re, rêxistin û binesaziya civakê hate avakirin, ev yek jî, bi rêya komîn û meclisan pêk hat. Armanca avakirina komînan ew bû ku gel rêxistina xwe bi xwe ava bike û pirsgirêkên xwe çareser bike.

Erka sereke ya komînê ew e, ku civakê li ser bingeha neteweya demokratîk, azadî, wekhevî û edaletê birêxistin bike. Li gorî vê yekê li her taxê komîn hatin avakirin û bi rêya van komînan civak li derdor hev dicive û dibe destpêka birêxistinkirin û xwerêvebirinê. Komîn dengê gel e, lewra pêwîst e gel û endamên komînê bi hev re pirsgirêkên xwe çareser bikin.

Rêber Apo di paradîgma û sîstema Netewa Demokratîk de, bi giranî balê dikşîne ser rol û misyona Komînê. Weke ku komîn bingeha hemû sîstem, sazî û destgehan e. Herwiha pênasekirina komîn bi rengê endam û kesên ku cihê xwe tê de digrin divê nebe û şaş e ev yek. Komîn malê hemû civakê ye û her kes endamê komînê tê hesibandin. Lê mixabin di roja me ya îro de ev yek ji cewherê xwe derketiye û weke ku komîn ayidî hin kesa ye hatiye destgirtin. Ev yek bi serê xwe jî mijara rexne, analîz û nirxandinê ye.

Di xala 31. a Hevpeymana Civakî de bal tê kişandin ser rola komînê ya di têkîliya ferd-civak çawa be. "Welatiyên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk kesayetek azad e, xwedî nirxên siyasî yên exlaqî û xwedî nasnameyeke piralî ye". ji vir û pê ve divê em rêxistikirina komînê ji xwe re weke bingeheke têkiliyên civakê û yên sîstema ku li ser bingeha Paradîgmeya Netewa Demokratîk hatiye avakirin, bibînin.

**Rola jin di komînê de**

Dema dibêjin komîn ku hemû ferdên civakê bi hemû reng, netew û baweriyên xwe cihê xwe tê de digrin. Di vir de divê em balê bikşînin ser rola jin di komîn de. Gelo jin di rêxistinkirin û girtina rola pêşengtiyê di komînan de, çiqas pêk anîne? Ev mijar ji mijarên sereke yên birêxistinkirin û gihîştina asta jin a di asta heyî de ye.

Tevî hebûna gelek sazî, tevger, partî û destgehên xweser yên jin jî, lê cihê herî sereke û bingehîn ku jin xwe tê de birêxistin bike û rêxistibûyînê bide meşandin; komîn e. Di hundir komînê de sîstema hevserokatiyê heye, li kêlek wê jî komîteyên ku bi karê gel û rêxistinkirinê re mijûl bibin hene. Jin di her alî de rola xwe dilîze û cih xwe digre. Li ser wê esasê xebatekî hevbeş di aliyê her du zayendan de tê meşandin.

Ji destpêka Şoreşa Rojava de jinê rol û teşeya xwe di nava xebatê komînê de wergirtiye û pêşengtî ji civakê re kiriye. ji tax û kolanan bigre heyanî destgeh û saziyên herêmê. Ev hêza ku niha jin xwe di astên rêveberiyê de dibîne, ji hêza xwebirêxistinkirinê ya komînê tê. Ji ber rêxistinbûyîna civakê ji pêkanîna xebatê komînê tê esasgirtin.

Helbet ev yek ne ji rêzê û ji ber xwe ve ne hatiye, bi qasî ku Rêber Apo girîngî dide rola jin di hemû aliyên civakê de, ev yek nedaye tu cihî. Bi giranî li ser mijarên perwerdê û xwebirêxistinkirinê rawestiye. Bi şoreşê re jî ev yek bi baldarî û giranî li ser hatibû rawestandin ku jin bikaribe rêxistinbûna xwe avabike û li hember guhartina zihniyeta mêr şer bike. Helbet gelek mijarên hişmendî, naxweşiyên malbat, civak û pergalê tîne ziman. Herwiha derbaskirina pirsgirêkên hişmendî yên jin û him yên zilam, ne hêsan in û têkoşîneke du alî jê re pêwîst e. Komîn jî, ji saziyeke xizmetê wêdatire, divê em bi çavê ku bicihkirina daxwaz û xezmeta gel tenê lê nenêr in. Komîn bingeha perwerdekirina civakê ye, hem bingeha guhertina zihniyetê û avakirina wê ye, di heman demê de danûstendina di navbera kesan de xurt dike, ev yek jî bi nêrîn û têkiliya her du zayendan ve girêdayî



ye. Gelo jin di komînê de çiqas ji bo guhartina zihniyeta zilam xwe westandiye, an jî zilam çiqasî jin li kêlek xwe qebûl kiriye û bê cudahî lê meyzandiye.

Ev hemû mijarên îdeolojîk in ku gihîştina civakeke wekhev û demokratîk ji têkîliya ku di komînê de tê avakirin, xweradigre. Lewra erka jin di komînê de, ji hebûnekê wêdatir e. Jin di komînê de pêşengtiya avakirin û guhartina zihniyetê dike. Her çiqas ev yel niha ji cewher hatiye derketin jî, lê divê em rola girîng a komînê bizanibin û xwe tê de avabikin.

Girêdayî girîngî, rol û rêxistinkirina jin di komînê de, di navber salên destpêkê yên Şoreşê û di dema niha de, jina bi navê Ayşa Xelef ku ji destpêka avakirina komînan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê cihê xwe di nava yek ji komînên taxa Kornîş a bajarê Qamişlo de digire, ji Rojnameya me re axivî.

Ayşe Xelef a 67 salî ji bajarê Qamişlo ku yek ji jinên destpêkê di nava Tevgera Azadiyê li Rojavayê Kuristanê de kar dikir, herwiha piştî pêketina agirê Şoreşa Rojava cihê xwe di rêxistinkirina komîn û xebatê jin de digirt û heya niha jî di komîteya lihevhatinê ya komîna taxa xwe de cih digre.

Dayîka Ayşe wiha behsa xebatê komînan û rola jin di destpêka şoreşê de kir: "Bi derketina Tevgera Azadiyê û belavbûna fikra Rêber Apo re, min cihê xwe di nava vî fikrî de girt. Herwiha bi Şoreşa Rojava re, min cihê xwe dibirêxistinkirina gel de girt û bi taybet di nava xebatên jin de. Li kêlek wê di dema ku komîn hatin avakirin yekser ez tevlî xebatên komînê yên taxê bûm. Êdî bi avabûna komînê re rêxistinbûyîna jin û civakê hat destpêkirin. Ez weke kes rûxmî zarokan û zexta malbatê, lê min dev ji vê xebatên komînê berneda, berovajî wê min xebatên xwe bêtir pêş xist."

**'Ger jin nebe komîn jî nabe'**

Ayşe Xelef axaftina xwe wiha qedand: "Di van demên dawiyê de cihgirtina jin di komînê de û karê wê tê de hêsantir bûye. Ger destpêkê em mal bi mal digeriyan, da ku em civînekê ji jin re çêbikin. Niha jin bi rihetî derdikevin û dikarin li cihê ku dixwazin kar bikin, kar dike. Ya din hebûna jin di demên berê de, ji niha çalaktir bû, me bi hezkirin ev xebat dikir ku jin gavên destpêkê yên ber bi têkbirina qeydên civakê ve diçe. Jin divê li gorî ew hebûn û giraniya ku di destpêkê de di komînê de rol digirt, niha jî bi wê helwestê cihê xwe di nava xebatê perwerdê û rêxistinkirinê de bigre. Ger jin nebe komîn jî nabe."

# 'Mala Jin cihê parastina mafê jinê ye'

**Stêrk mihemed/Qamişlo**

**Rêveberiya Mala Jin a kampa Newroz Asiye Cefer diyar kir ku armanca me ji avakirina Mala jinê ew e ku jin ji bin bandora desthilatdariya ku koletiyê li ser jin ferz dike, û bê maf dihêle xwe rizgar bike.**

Bi dagirkirina Serê kaniyê, Girê spî û Efrînê re gelek kes koçber bûn. Yên ku herê zêde bandor bû û bû Qurban jin û zarok bûn, ji ber ku jin di nava şer de rastî tacîz, tecewîz û tundiyê tên, êdî jin ji ber zihniyeta desthilatadar hat tunekirin, ji ber vê jî ji bo parastina mafê jin cihên girêdayî jin hatin ava kirin û yek ji wan cihan jî Mala jinê ye, herwiha ku tê de pirsgirêk û zehmetiyê ku jin dikşîne tên çarederkirin. Jin ne



koleye lê zihniyeta desthilatadar jin ê ji xwe re kirin kol e.

Derbarê mijarê de rêveberiya Mala Jin a kampa Newroz Asiye Cefer ji Rojnameya me re axivî.

**Mala jin 3 salin Li Kampa Newroz parastina mefê jin dike**

Asiye Cefer da zanîn ku ev 3 salin mala jinê di kampê de hatiye avakirin û wiha got: "Armanca me ji avakirina Mala jinê di nava kampê de ku em zîhniyeta desthilatadar û qirkirinê yên li ser jinê di nava civakê de li hatiye çandin li hemberê wî tekoşîn bikin û li şûna wê îdeolojî hevjiyana azad û civaka demokratîk ava bikin. Zîhniyeta zayendperestî, desthilatdarî, qirkirin û baviksalariyê di nava civakê de hatiye belav kirin û bandora wê li ser civakê kiriye, ji ber ku civak hertim jinê biçûk dibîne û kole dibîne ji ber vê jî cihên girêdayî jinê hatin avakirina ku tê de parastina mafê jinê were kirin û pirsgirêk jinê çareser bikin yek ji wan cihan jî Mala Jinê ye.

**'perwerdekirina jinê rizgarkirina ji koletiyê ye'**

Asiye da xuyakirin ku perwerdekirina jinê rizgarkirina ji koletiyê ye û wiha domand: "Di nava kampê de ji bo hişyarkirinê civakê ji zîhniyeta zayendperestî, desthilatdarî, koletî a baviksalarî perwerde tên dayîn, perwerdeyên ku tên dayîn li ser zewacê bi temen biçûk, pir zewacî, destdirêjiyê cinsî û destdirêjiyê li ser zarokan e. Di nava civakê me de pir jinî weke mafekî rawa tê dîtin, ku di bin navê xweda pir jinî helel kiriye de mêr bi 4 jinan re dicewize, ev ne mafe lê belê tundî ye.

Zewaca bi temenê biçûk di nava civakê de belav bûye, keçikê bi temen biçûk ji dibistanê qut dikin û wê dizewicînin dibêjin ku jin aîdê zilame û dayka zaroka ye ne yê xwandin û zanebûn ye. Jin kirine bindest û mêr jî xwe kirine serdest ku ew azade jinê bikuje, tundiyê li ser bimeşîne û mafê wê tune bike ji ber vê jî ji bo hişyarkirinê civakê perwerde tên dayîn."

**'pêwîste zilam xwe ji vê hişmendiya şaş û desthilatdar rizgar bike'**

Rêveberiya Mala Jin a kampa Newroz Asiye Cefer axaftina xwe wiha qedand: "Jin ne kole û lîstokê zilam e, pêwîste zilam xwe ji vê hişmendiya şaş û desthilatdar rizgar bike. Jin tu carî ne bindest bû lê ew kirin blindest, lê bi saya fikir û felsefeya Rêber Apo jinê karîbû carek din di rêya azadî û aştîyê bimeşe. Em jiyanek wekhev û îdolojiya hevjiyan azad di nava jin û mêr de dixwazin. Civaka me divê li ser esasê wekhavî, netewa demokratîk û azadî jinê bimeşe, ne li ser esasê zayendperestî, desthilatdarî û koletiya jinê be."



# Şoreşa 19'ê Tîrmehê zimanê dayîkê ji qirkirinê parast

Şoreşa Rojava ne tenê gelê Kurd ji qirkirinê parast, çand û hunera tevahiya gelên herêmê jî parast û pêş xist, bi taybetî zimanê dayikê, lewra ziman nasnameya civakê ye. Endama Saziya Zimanê Kurdî Delal El-Haşimî diyar kir ku bi saya şoreşê zimanê dayikê ji qirkirinê hat parastin.

**Dilîn Ehmed/Qamişlo**

Şerê Sûriyeyê yê navxweyî bi xwepêşandanan dest pê kir. Piştî ku şer dest pê kir,dewleta Tirkiyê û Îranê destek dane şer, ji aliyekî Tirkiyeyê piştgirî da çekdarên muxalefetê û xwest wan li hember rejîma Baasê bi ser bixin, ji aliyekî din jî Îranê piştgirî da rejîma Baas. Bi van mudaxaleyan Sûriyeyê ji rastiya xwe dûr ket û ket bin kontrola hêzên derve. Di encamê de gelek komên çekdar yên îslamî hatin avakirin û birêxistin kirin.

**Ji bo parastina gel rêyek nû**

Ji ber ku bi sedê sala ye li Sûriyê gelê Kurd ji hemû mafên xwe yên jiyanê bê par mabû, bi armanca parastina mafê gelê herêmê bi taybetî gelê Kurd, Kurdan xwe li herdu aliyên şer jî negirtin û xeta sêyemîn ya avakirina jiyaneke demokratîk hilbijartin. Di di 19'ê Tîrmeha 2012'an de Şoreşa Rojava dest pê kir. Roj bi roj Şoreşa Rojava mezin bû, gel û pêkhateyên li herêmê xwe tev li Şoreşê kirin. Bi pêşengiya jin û ciwanan Şoreşa Rojava bi demê re gihîşt wê astê ku tevahiya herêmê û cîhanê ji êrîşên rêxistina herî xeter DAIŞ'ê biparêze.

Li aliyekî din ji ber ku civak bi zimanê xwe tê naskirin, kar û xebata Şoreşa Rojava beriya her tiştî dest bi pêşxistina ziman û avakirina dibistanan kir. Tevlî ku hejmareke mezin ji xelkê herêmê zimanê Kurdî redkirin, mamosteyan dev ji karê xwe yê ji bo pêşxistina zimanê bernedan. Berovajî wê sal bi sal kar û xebata xwe pêşxistin û li hember mamosteyên rejîma Baas li ber xwe dan.

Di destpêkê de tîp û bingehên ziman li malan hatin dayîn, heta ku hejmareke mezin ji maomseteyan amadebûn, di 11`ê Mijdara 2012 derbasî dibistana bûn tevî ji aliyê mamosteyên rejîmê rastî astengiyan dibûn, lê mamosteyên zimanê Kurdî dev ji armanca xwe bernedan û di hefeteyê sê seetan zimanê kurdî didan şagirtan. Ji bo perwerdekirina mamosteyan her wiha ji bo mamosteyên alîkar jî, di 2015`an de peymangeh hatin vekirin. Di peymangehê de sê qunax hebû eger mamoste bi ser biketana bi vekirina dibistanan de dest bi perwerdekirina şagirtan dikirn, eger bi ser neketane perwerdeyên xwe li peymangehê berdewam dikin. Di heman salê de zanîngehên bi zimanê Kurdî jî hatin vekirin.

**'Şoreşa Rojava jiyan ji jinê re afirand'**

Drbarê girîngiya zimanê dayikê di şoreşa 19'ê Tîrmehê de Endama Saziya Zimanê Kurdî ya girêdayî Desteya Perwerdê a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Delal El-Haşimî ji Rojnameya me re axivî.

Delal El-Haşimî di destpêka axaftina xwe de wiha got: "Bê gûman gelê Kurd bi sala ye li Sûriyê ji mafê xwe hatibû qedexekirin, yek jê ya sereke perwerdekirina bi zimanê dayîkê ye bû. Bi saya Şoreşê gel bi berxwedan û têkoşîna xwe ya bê hempa, sal bi sal mafê xwe bi dest xist, bi taybetî jin, ew jina ku bi sala ye ji bilî xwedîkirina zarokan û karê malê tiştekî din nedikir. Bi destpêkirina Şoreşê re jin di qada siyasî, leşkerî û civakî kar û xebat bi rêve dibe. Mirov dikare vê yekê bêje ku Şoreşa Rojava jiyan ji jinan re afirand."

**'Qedexikirina bi sala nayê ji bîr kirin'**

Li ser kar û xebatê mamosteyan ya ji bo pêşxistina zimanê dayîkê, mamoste Delal diyar kir ku parstina zimanê Kurdî yak ji şert û mercên sereke yên Şoreşê bû. Delal wiha axaftina xwe berdewam kir: "Mafê perwerdeya bi zimanê dayîkê



mafekî xweza û rawere, lewra civak bi zimanê xwe tê naskirin. Ji xwe ziman şertekî pêşîne ku ev şoreş bi ser bikeve. Ew qedexekirina bi sedê sala li ser zimanê me nayê jibîrkirin. Lewra bi despêkirina Şoreşê re ji bo pêşxistina zimanê kurdî em wekî mamosteyan bi hemû enerjî û hêza xwe tevlî kar û xebatê kir. Di encama xebata 13`e salan zarokên me di zimanê Kurdî de bûne pisbor. Êdî ew bi zimanê zikmakî bi serbestî, dijîn. Ji bo civaka me neyê wenda kirin divê em li ziman, çand û hunera xwe xwedî derkevin."

**'Hebûna ziman dayîkê hebûna civakê ye'**

Delal destnîşankir ku, ziman hebûna civakê ye, lewra xwedîreketina li zimanê Kurdî xwedîderketina destkeftiyên Şoreşa Rojava ye yak u bi xwîna keç û xurtên civakê hatiye bidestxistin. Ji bo wê mamoste Delal bal kişand ser girîngiya pêşxistina zimanê Kurdî û wiha got: "Heta ku mirovek bi zimanê dayîkê biaxive, wê civak zindî bimîne. Lewra hebûna ziman û pêşxistina wê, hebûn û pêşxistina dîroka civakê ye."

**'Divê zimanê Kurdî bibe zimankî fermî'**

Endama Saziya Zimanê Kurdî ya girêdayî Desteya Perwerdê Bakur û Rojhilatê Sûriyê Delal El-Haşimî li ser rewşa zimanê Kurdî ya piştî ketina rejîma Baas axaftina xwe wiha bidawî kir: "Helbet rejîmê gelê Kurd sînordar kiribû, tevî ku Şoreşa 19`ê Tîrmehê bê gûman Şoreşeke dîrokî bû lê ev yek têrê nekirê. Piştî ketina rejîma Baas Sûrî kete warekî nû de. Ji bo wê ya herî girîn ew e ku di destûra Sûrî ye nû de, zimanê Kurdî bibe zimanekî fermi. Ne tenê li cihê ku Kurd lê dijîn, divê li tevahiya Sûriyê li dibistan û zanîngehê wê ziamnê Kurdî bibe zimanekî fermî. Ta ku nifşên me yên nû bi bawernameyên xwe li cihê ku ew bixwazin, di saziyan de bixebitin. Ji bilî wê mirov nikare bêje ku Sûryeke nû hatiye avakirin, lewra hişmendî nehatiye guhertin."

# Çend gotin li ser wêjeyê (4)

**Cîger Efrîn**

Hinek nivîskar dibêjin; "Ez ji bo îro nanivîsim, ez ji dema pêş re dinivîsim". Ez bawer nakim ku, li ser rûyê erdê yek nivîskar/wêjevan heye û dibêje; "Ez ji bo îro dinivîsim"! Ji xwe gava wisa bêje, an jî bi wê dîtinê binivîse, nikare behremendiya xwe derxîne holê. Di vir de pirsa girîng ew e; ew wêjevan/nivîskarên îro çawa dibîne, çawa digire dest û perspektîfa wî/wê çi ye? Em dizanin ku, îro ji duh û sibê qut nîne. Îro ya ku ji dema pêş û paş wê hatiye qutkirin, bi tenê kêliya ku kes têde jiyan dike tune ye û felsefa ku angaşt dike ku heye jî felsefa Modernîteya Kapîtalîst, lîberalîzm û derveyî civakê/civakbûyînê ye.

Ji hêla din ve gava em bala xwe bidin çîroka romanê dibînin ku hemû çîrok xwedî zimanekî ne û ziman jî ji xalekê dest pê dike û li cihekî diqede. Ango çîroka romanê jî ne kêliyek e, xwedî zemanekî ye û ew zeman jî bi hin bûyer û bûyînan-hebûna xwe gihandiye wateyekê. Di bingehê de bûyerên ku di bin baskê zemanê çîroka qewimîne de ew romana kiriye xwedî nirx.

Mînak; li welatekî mîna Kurdistanê hatiye parçekirin û gelê wê hatiye înkarkirin, mirov rabe ji fantaziyên kapîtalîzmê bike babeta roman, çîrok an jî helbestê wê ew berhem çiqasa nasnameya gelê Kurd û doza wî bi gelên cîhanê bide naskirin û xizmeta hebûn û awayê bûyîna gelê Kurdistanê bike? Belkî jî berhema xwe pir baş hûnan dibe. Bê guman wêjevan dikare her mijarekê bike dabaşa berhema xwe û bi zimanekî xweş jî bihûne. Lê gotineke Kurdan heye; "hêştir bi pênc qurişan bû pênc quriş peyda nebûn, pênc quriş peyda bûn hêştir peyda nebû". Bi kurtasî tişta di dema pêwîstî pê heye û peyda nebû, tu xêra wê tune ye. Gava em bi hev re çavekî biavêjin berhemên wêjevan û nivîskarên gelên ku têkoşîna rizgarî û azadiya xwe dane meşandin, em dibînin ku, tevan li ser şoreşê û pêwîstiyên azadiya gelê xwe nivîsandine. Ya din jî bi awayekî vekirî û zelal rewşa gel û şoreşê anîne ziman û lehengekî xwe bi evîna keçekî nedane nasîn. Gava ciwanekî Kurd "Siya Evînê" bixwîne, wê Memdûh Selîm Beg û evîna wî ya keça Çerkes bibîne û Memdûh Selîm Beg di hişê wî/wê de bi tenê wekî evîndarekî nas bike û dilê wî/wê jî bi rewşa Memdûh Beg bişewite. Halbûkî Memdûh Beg diviyabû bi sekna xwe bihata nasîn, ne bi evîna wî ya keça Çerkes. Her wiha em yek nivîskarî/ê ku welatê xwe bi navekî din pênase kirî nabînin. Wekî din tê zanîn, beriya şoreşa Kurdistanê li Kurdistanê wêjeyeke xurt tune bû. Ya heyî jî bi tenê kesên ku li dibistanan xwendine dizanîn û li gorî hêza xwe hewleke wan hebû. Lê têrî hişyarkirina gel û rêxistinkirina wî nedikir. Bi saya wan şagirtin dibistanan destana Mem û Zînê bi devkî heta astekê di nava gel de belav bû. Lê destana Ehmedê Xanî jî bi tenê aliyê wê yê evînî dihat nasîn. Şirovekirina wê, peyamên Xanî yên netewî, girngiya rêxistinkirina gel û têkoşînê di bin siya êşa Mem û Zînê de wenda dibû-bûbû.

Tam di vir de dikarim vê bêjim; gava bi awayekî serkeftî berhemeke Kurdistanî derkete holê, ew berhem di heman demê de dibe berhemeke rojhilata navîn û cîhanî. Ji ber ku mijarên gel-civaka Kurdistanê ji yên gel û civakên din ne qut in û heta çavkaniya piraniya pirsgirêkên gelên-civakên rojhilata navî Kurdistan û dagirkeriya çar dewletên li ser Kurdistanê ye. Îro heger civaka Kurdistanê azad ba, wê rewşa gelên netewên Sûrî, Îraq, Îran û Tirkiyê jî ne wiha ba. Kesayeta mirovên wan civakan ji kesayeta mirovên civaka Kurd pir baştir nîne. Heta ji ber ku li dijî serdestên xwe tênakoşin, mirov dikare bêje ku, ji kesayeta mirovên Kurd pirtir ketiye. Gava mirov bi awayekî objektîf nêz bibe, mirov vê rastiyê pir zelal dibîne. Heqîqet ev e; Rêber Apo bi dahûrandinên ku pêşxistine heta asteke bilind karê wêjevan û nivîskarên Kurd hêsan kiriye. Bi tenê maye ku nivîskar, wêjevan li gorî zanebûn û xwesteka xwe, li gorî pêdiviya civak û şoreşa Kurdistanê mijarekê ji xwe re diyar bike. Rêber Apo vê rastiyê wiha bi lêv dike; "… Eger (wêjevan) nikare gelek mijarên ku bi salan li ser sekinîne tespît bike, nikare bibe wêjevanekî xurt. Eger ew bi xwe kesekî bê rih be, ew nikare gelekî bi şoreş û wêjeyê ve terbiye bike. Nikare vê hunera wêje û wêjevaniyê bi hêjayî pêk bîne. Wê teng nêzî pirsgirêkan bibe. Bila ew bi xwe jî pirsgirêkan bibîne û jê re bibe hêza çareseriyê! Ger bi xwe jî pirsgirêkan rast nebîne, nikare bi xwe jî şîrove bike û piştre jî bêje; "Ez wêjevanek baş im" ev xwe xapandine." Mesele tev ev e; wêjevanên Kurdistanê dixwazin xwe bixapînin an naxwazin xwe bixapînin!

# Şoreşa Gelan

Pêkhateyên Kurd, Ereb, Suryan û Ermen diyar kirin ku Şoreşa 19'ê Tîrmehê ji her kesî re diyar kir ku dîrok nayê jibîrkirin û azadî ne xewnek e, lê mafekî şoreşgerî ye ku divê were desteserkirin û gotin "Ger şoreş bi destê gelan pêk nehatiba bi ser nediket."

**Ronahî Sadûn/Qamilo**


Anahîd Qesebyan


Sebah Şabo


Xufran Xelef


Mihyedîn Hesen

Bi pêşengiya gelê Kurd di sala 2012'an de tovê Şoreşa 19'ê Tîrmehê li bajarê Kobanê yê Sûriyê şîn bû û li Rojavayê Kurdistanê hat belavkirin. Êdî bi şoreşê re qonaxa paqijkirinê ji hêz û saziyên rêjîma Baasê hat destpêkirin. Şoreş jî mîna tava rojê tîrêjên xwe berda nava bajarên din ên Rojavayê Kurdistanê weke; Efrîn û Cizîrê.

Ev şoreş ji şoreşên din ên ku di dîrokê de hatine lidarketin cûda ye, cûdabûna wê jî di fikir û projeya şoreşê de ye ku ew jî "Projeya Neteweya Demoratîk e" ya ku ji aliyê Rêber Apo ve hatiye pêşxistin. Di bin sîwana vê projeyê de gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatin bi rêxistinkirin û hevgirtina gelan bingeh hate girtin.

Şoreşa 19'ê Tîrmehê ne tenê hevgirtin di nava gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de, da avakirin, lê derî li pêşiya rastiyên dîrokî vekirin, hem jî qalibê yekrengiya ziman, çand û hwd…şikand û derfeteke ji tasên zîrîn li pêşiya pêkhateyên Kurd, Ereb, Suryan, Asur, Çerkes, Ermen, Xiristiyan û hwd. vekir ku bi ziman, çand û rengên xwe yên taybet bijîn an jî bi gotineke din ew bixwe êdî xwe û nasnameya xwe nas bikin.

Şoreşa Rojava sererastkirina şaştiyên dîrokî bû ku heta kêliya şoreşê jî li ser pêkhateyên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ftineyên etnîkî, olî û mezhebî ku civakan lewaz bikin ji aliyê hêzên hegemon û dagirker ve, dihat meşandin, lê şoreşê ev yek li ser pêkhateyan rahiştê, niha jî tam ev rêbaz li deverên din ên Sûriyê û cîhanê tê meşandin.

Şoreşa 19' Tîrmehê di xeta sêyemîn de rê da ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê zimanê wan neyê pişaftin û her pêkhate mafê xwe bi dest bixe, çand û zimanê xwe bide jiyîn. Şoreşa 19'ê Tîrmehê ne tenê ji bo gelê heremê ji bo hemû mirovahiyê bi demê re bû hêviya azadiyê.

Derbarê Şoreşa 19'ê Tîrmehê de pêkhateyên Kurd, Ereb, Suryan û Ermen ji Rojnameya me re axivîn. Pêkhateya Ermen Anahîd Qesebyan diyar kir ku di hişmendiya civaka Ermenî de Şoreşa 19'ê Tîrmehê şoreşa rûmet û azadiyê ye û wiha got: "Şoreşa 19'ê Tîrmehê ne tenê bûyerek dîrokî ye, lê ew kêliyek şoreşgerî ye ku serhildana gelan li dijî her cûre neheqî û zilmê, temsîl dike, herwiha¬¬¬¬ destpêka qonaxek nû ya têkoşîn û berxwedanê ye ku ji bilî azadî û edaletê tiştekî din qebûl nake. Ji bo civaka Ermenî jî ev şoreş teqînek şoreşgerî ya navxweyî temsîl dikir, ji çarçoveya siyasî derbas bû û gihîşt kûrahiya hişmendiya kolektîf û bîra dîrokî ya tijî trajediyan veguherand hêzeke mezin ji bo guhertin û rizgariyê. Piştî sedsalan ji qirkirin, koçberî û hewldanên tunekirin, Şoreşa 19'ê Tîrmehê ji her kesî re diyar kir ku dîrok nayê jibîrkirin û azadî ne xewnek e, lê mafekî şoreşgerî ye ku divê were desteserkirin.

Di dilê vê şoreşê de têgeha şoreşeke rastîn li hemberî bêdadî û teslîmbûna li hember îradeya desthilatdarên ku dixwaze dengê gel bitepisîne û tevna wan a civakî parçe bike, lê dide. Ev şoreş li ser bingehên edaleta civakî, wekheviya di navbera hemû pêkhateyan de ku her kes bi nasname û mafên xwe bêyî tirs û zordariyê xwe îfade bike, hatiye avakirin."

**'Şoreş ne tenê serhildanek demkî ye'**

Anahîd Qesebyan anî ziman ku Şoreşa 19'ê Tîrmehê derfeta dîrokî ye û wiha pê de çû: "Civaka Ermenî vê şoreşê wekî derfeteke dîrokî dibîne ku ne tenê ji bo naskirina mafên xwe, lê di heman demê de ew pêşeroja Sûriyeke azad û demokratîk e. Şoreşa 19'ê Tîrmehê di hundirê xwe de wê fikrê hildigire ku rizgarî tenê bi hevgirtin, yekîtî û hevkariya di navbera gelan de, dikare were bidestxistin û her hewildaneke derveyî vê, dijberiya ruhê şoreşê ye. Ermenî jî bawer dikin ku şoreş ne tenê serhildanek demkî ye, lê pêvajoyeke berdewam a avakirina civakeke nû ye, civakeke li ser bingehê azadî, rûmet û edaleta civakî, civakeke ku pergalên kevn ên bindestiyê dixe lêpirsînê û hemû şêweyên serdestiya siyasî û desthilatdariyê red dike. Ji ber vê yekê şoreş cihê hêviyê ye, ne dawiya têkoşînê ye. Ew dersek li ser berdewamî û serhildanê ye, modeleke ji bo veguherandina êş û bîranînan bi hêzek bi bandor ji bo avakirina siberojek cûda ku mafê her pêkhateyên Sûriyê ji bo jiyaneke azad û wekhev diparêze."

Anahîd Qesebyan axaftina xwe wiha qedand: "Wekî ku şoreşgerekî mezin gotiye: "Şoreş ne diyariyeke ku were dayîn, lê agire ku di dilê her kesê ku neheqiyê red dike de, pêdikeve. Azadî mafeke ku nayê xwestin, lê bi biryardarî û fedakariyê tê bidestxistin."Bila Şoreşa 19'ê Tîrmehê di wijdanê civaka Ermenî de û hemû kesên ku bawer dikin rûmet û azadî berdewamiya jiyanê ne û têkoşîna ji bo wan erkekî bêdawî ye, bibe agirê bê dawî."

**'Me xwe beşek ji vê şoreşê dît'**

Pêkhateya Suryan Sebah Şabo eşkere kir ku Şoreşa 19'ê Tîrmehê şoreşa veguherîneke siyasî, çandî û civakî ye û wiha got: "Şoreşa Rojava şoreşa bidestxistina maf û misogerkirina jiyana hevbeş a jiyana azad e. Ew şoreşa gelan a li dijî desthilata Baas a zalim bû. Ev şoreş bi pêşengiya gelê Kurd dest pê kir û belav bû, em jî weke gelê Suryanî di herêmê me xwe beşek ji vê şoreşê dît û tevlî bûn. Tişta ku em ber bi şoreşê ve kişandin rêxistinbûyîna şoreşê û pêşengiya jinê jê re. Em jî weke gelên din ên Sûriyê, me gelek zilm û zordarî dît û hatin paşguhkirin, ji ber wê me hebûna xwe di vê şoreşê de dît. Tişta ku hişt ev şoreş serkeftinan qezenc bike jî, hevgertina gelan bû ji bo wê navê şoreşa gelan lê hat kirin. Di sedema rêjma Baas de, tenê em li Dêrê dema îbadetê bi zimanê Suryanî diaxivîn, ji ber herî zêde zimanê erebî li ser me dihat ferzkirin, zimanê Suryanî paşguh dikirin û tenê wekî zimanê îbadetê nîşan didan, ev hemû ji ber siyasetên li ser gelê Suryanî bû. Lê şoreşa 19'ê Tîrmehê vejîna gelên bindest ên herêmê bû. Avakirina Rêveberiya Xweser misogerkirina mafê hemû gelan bû. Ji bo wê em dixwazin vê tecrûbeya Rêveberiya Xweser li tevahî Sûriyê bê pêkanîn, ji bo mafê hemû gelan di siberojeke azad de bê parastin. Şoreşa 19'ê Tîrmehê şoreşa nûbûn û jiyanê ye, herwiha şoreşa jinê ye û jin jî jiyane."

**'Rêya azadiyê rêya pîroz e û dîrok şahidiya vê rêyê dike'**

Pêkhateya Ereb Xufran Xelef piştrast kir ku rêya azadiyê rêyek pîroz e û wiha domand: "Beriya Şoreşa 19'ê Tîrmehê gelên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê jiyan dikirin ji neheqî û dûrxistinê êş dikişandin. Lê gelê azad ev zincîra ku li ser rêya wan hatibû danîn, şikan. Ji ber vê yekê, em dibînin ku destkeftiyên şoreşê bi rastî di pergala Rêveberiya Xweser de xuya bûn ku mafê rêvebirina xwe û çavkaniyên xwe da gel. Ev şoreş wekî şoreşa rastîn li cîhanê tê hesibandin, ji ber ku gelê me ji zordariyê êş kişand û gel li dijî vê zordariyê rabû. Ji bo ev şoreş jî biser bikeve şehîd, hatin dayîn. Rêya azadiyê rêyek pîroz e û dîrok şahidiya qurbaniyên gel dike, da ku azadiya xwe bi dest bixe. Parastina destkeftiyên şoreşê xala herî girîng e, ji ber ku qurbaniyên gihîştina van destkeftiyan mezin bûn. Lewra divê gelê me yê azad bi hemû pêkhateyên xwe re mil bi mil van destkeftiyan biparêze."

**'Bizrê Şoreşa 19'ê Tîrmehê şîn bû'**

Pêkhateyê Kurd Mihyedîn Hesen Şoreşa 19'ê Tîrmehê bi şoreşa rûmetê pênase kir û wiha got: "Şoreşa 19'ê Tîrmehê cihê rûmetê ye, ji bo wê em wan şehîdên destpêkê ku ev şoreş lidar xistin û em gihandin vê qonaxê, di şexsê wan şehîdan de hemû şehîdên şoreşê bi bîr tînin û bejna xwe li hemberî wan ditewînin. Bizrê Şoreşa 19'ê Tîrmehê ji Kobanê şîn bû û li Rojavayê Kurdistanê hat belavkirin. Piştî şoreş hat belavkirin û ji bo kar xebat bêtir were birxistinkirin, komîn û malên gel hatin avakirin, da ku xizmetkarê gel bin, li kêlek wê dibistanên kurdî hatin vekirin. Hem mala jin, ciwan û her tişt di tax, gund û bajaran de hatin avakirin, da ku ew belavbûna rejîmê li dû xwe hiştibû were dagirtin û gel bajarên xwe birêve bibin û ava bikin."

**'Tenê bi proja Neteweya Demokratîk Sûriyeke azad bê avakirin'**

Mihyedîn Hesen axaftina xwe wiha bidawî kir: "Di di destpêka şoreşê de rêjîma Baas paytexta xwe parast û gel bi destê çeteyan ve hişt ku wê demê çeteyên Cebhet-Elnesra bû, piştre jî DAIŞ û gelek çeteyên bi ser Tirkiyê ve êrişî gund û bajaran kirin, di wir de gel bi dilxwazî parastina xwe da avakirin bi navê Hêzên Cewherî. Hemû xebat bi hevkariya gel û şervanên QSD, YPG û YPJ'ê heta roja îro hat meşandin û tê meşandin. Lê em ne bi hêsanî gihan heya roja îro ji ber di oxira jiyaneke rast û azad de bi hezaran şehîd û birîndar hatin dayîn. Di qonaxa niha jî hêza herî birêxistinkirî li ser rûyê erdê ya QSD'ê ye, ev bû sîwana hêzê ji hemû pêkhateyan re û hemû pêkhate jî di nava xwe de hembêz kir, ev jî bi hevgirtina gelan a bi ruhê Şerê Gelê Şoreşgerî em gihiştin vê astê. Tevî van hemû fedekariyan jî, lê hîna hewldanên şerê taybet ku hevgirtina gelan xera bike û şoreşê têk bibe, berdewame. Em a di her demekê de ev gel kefenê xwe dadîtinî ser destê xwe mînaka wê Bedava Tişrînê gel û şervan bûne yek ji bo parastina şoreşa xwe û hevgirtina xwe. Dîsa jî piştî rêjma Baas têk çû, kesên ku hatin ser desthilatdariyê tu pîvanên mirovahiyê nas nakin û ji rêjma Baas xerabtir jî dike. Ji bo wê tenê bi proja Neteweya Demokratîk Sûriyeke azad bê avakirin."



# 'Rêber Abdullah Ocalan şoreşeke hişmendî û rewşenbîrî li dijî netew-dewletê dide meşandin'

Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk, di 9'ê Tîrmehê de bi bangawaziyeke dîrokî ji aliyê Rêber Abdullah Ocalan ve derbasî qonaxeke nû bû. Doktorê Zanistên Siyasî yê Misrî Taha Elî destnîşan kir ku Parlamentoya Tirkiyê dikare di qonaxa niha de roleke girîng bilîze û reformên destûrî û yasayî yên ku mafên çandî û siyasî yên Kurdan garantî dikin, pesend bike.

**Esma Miştefa/Qamişlo**





Di çarçoveya banga Aştî û Civaka Demokratîk a ku di 27'ê Sibatê de ji aliyê Rêber Abdullah Ocalan ve hatiye kirin, di 9'ê Tîrmehê bi bangeke bi dîmen ji aliyê Rêber Abdullah Ocalan ve derbasî qonaxeke nû bû. Girêdayî vê yekê Doktorê Zanistên Siyasî yê Misrî Taha Elî bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Di çarçoveya pêşxistina Banga Aştî û Civaka Demokratîk de, di 9'ê Tîrmeha 2025'an de, Rêber Abdullah Ocalan bi dîmen bangeke dîrokî kir û ji bo tevahî aliyan peyamek da. Hûn naveroka peyamê çawa dixwînin?**

Bi giştî ev peyam ji bo piştgiriya înîsiyatîfa aştiyê ya 27'ê Sibatê tê. Her wiha berdewamiya bangewaziya ku di nameya 9'ê Tîrmehê de cih girtiye, nîşan dide ku pabendbûna giştî ya ji bo çareseriyeke aştiyane, bi şertê ku îradeya siyasî û çavdêriya sazî ya aliyê Tirkiyê hebe, nîşan dide. Her wiha hate destnîşankirin ku naveroka her du nameyan li ser bingeha demokrasî û dadmendiyê wekî referansa wan bû, ji ber ku ew li ser bingehek sazûmanî bi daxwaza çavdêriya parlamentoyê hatine damezrandin. Ev yek veguherîna dosyaya aştiyê ji çarçoveya ewlehiyê ber bi sazûmanek sivîl nîşan dide. ev yek jî gavavêtineke bi nêtalîk a di çarçoveya insiyatîfa aştiyê ye.

**Di peyama Rêber Abdullah Ocalan de gavên bingehîn ên serkeftina pêvajoya aştiyê hatin destnîşankirin: Hûn rola partiyên Tirkiyê bi giştî û DEM Partî bi taybetî çawa dibînin?**

Ez teqdîr dikim ku partiyên tirk di vê qonaxê de xwedî roleke sereke ne, nemaze ji ber ku bi giştî di pêvajoya aştiyê de, ne xwediyê helwesteke yekgirtî ne û helwestên wan ji hev cuda ne. Mînak, Partiya CHP'ê ya desthilatdar, di sala 2013 – 2015 de pêvajoyek bi heman rengî bi rê ve bir, lê piştî hilbijartinên Hezîrana 2015-an, dema ku dest bi zêdekirina leşkerî kir, zû paşde vekişiya. Tevî ku Partiya Komarî ya Gel banga reformên demokratîk dike jî, di pêvajoya aştiyê de helwesteke dudil digire. Ji ber vê yekê ew di piştgiriya xwe ya ji bo wê û ji tirsa windakirina piştgiriya neteweyî de, neçalake û bê biryar e.

Di dema ku DEM Partî di piştgirîkirina pêvajoya aştiyê ya li hundirê Tirkiyê de roleke sereke lîst, partî bû pira di navbera Ocalan û raya giştî de û peyamên xwe ji civakê re ragihand. Bi rastî jî partiyê ne tenê li ser mafên kurdan rawestiya, di heman demê de xebatên xwe berfireh kir û mafên jinan û çînên marjînal (hatine jibîrkirin) jî bi nav kir.

Ev li jor tê wê wateyê ku her astengiyek di pêvajoya aştiyê de ne ji ber kêmbûna dîtinê bû, lê ji ber nebûna îradeya siyasî ya dewleta Tirkiyê û bilindbûna neteweperestiyê bû. Taybet piştî hewldana derbeyê ya îdiakirî di Adara 2015'an de, rûxmî ku peyamên Ocalan hîn jî nêrînek stratejîk ji bo çareseriyek domdar heye ku pêdivî bi hawîrdorek siyasî ya vekirî û naskirina rastîn a piralîbûnê heye.

**Rêber Abdullah Ocalan di qonaxa pêş de behsa rola Parlamentoya Tirkiyê kir. Bi nêrîna we, parlamento dê erkên xwe yên derbarê dabînkirina şert û mercên yasayî û siyasî ji bo çareseriyan bi cih bîne?**

Bi giştî Parlamentoya Tirkiyê dikare di qonaxa niha de roleke girîng bilîze, ji ber ku dikare reformên destûrî û yasayî yên ku mafên çandî û siyasî yên kurdan garantî dikin pesend bike. Her wiha qanûnên ku rê dide diyalogê bi aktoran re, di nav de kanalên qanûnî yên danûstandinên yekser bi Ocalan re, derxîne. Her wiha dabînkirina jîngeheke siyasî ya demokratîk ku beşdariya wekhev a hemû pêkhateyan teşwîq dik, pêk bîne.

Lê bi awayekî realîst, em li rastiya niha ya Parlamentoya Tirkiyê dinêrin, em dibînin ku ew rastî nekontrolkirin û lawazbûneke ber bi çav di aliyê desteya cibcîkar û lawazbûna serxwebûnê de dikşîne, nemaze piştî guhertinên destûrî yên ku di sala 2017'an de hatine kirin û sîstema serokatiyê ava kirine, di wir de rola parlementoyê gelekî kêm bû û parlamento zêdetir bûye wek amûreke derbasbûnê ji bo siyasetên desthilata cîbicîkar û serokomar bûye cihê herî bilind û girîng di biryardariyê de, bê guman tê de dosyaya gelê Kurd. Ku di vê derbarê de tenê serokomar biryaran distîne. Bê guman ev yek bi hevbendiya neteweperest a rastgir ku bi tundî dijminatiya her çareseriyek siyasî ye ku diyaloga bi Ocalan re an jî naskirina pirsgirêka kurdî dihewîne. Ev tê vê wateyê ku ji ber îradeya lawaz a qanûndanînê, ji bo her gavên pêwîst piştgiriya serokatiyê dikin. Me ferq kir ku sînordariyeke berçav li ser opozisyonê heye û li şûna ku parlamento bibe qada diyalogê, ew bûye platformek ji bo krîmînalîzekirina muxalefetê, bi taybetî nûnerên Partiya Komarî ya Gel ku li ser hejmareke mezin ji wan parêzbendiya (Hesanê) wan hatiye rakirin, ji şaredaran hatin girtin, ev yek jî rola parlamentoyê asteng dike. Ev hemû pêbaweriya ku ji bo piştgirîkirina pêvajoya aştiyê wekî hewayek pêwîst hewce dike, qels dike

.

**Terikandina netew-dewletê û stratejiya şer yek ji mijarên girîng e ku Rêber Abdullah Ocalan diyar kir û guhertina wê bi qonaxeke diyalog û aştiyê weke serketinê bi nav kir. Hûn dikarin mabesta ji vê yekê rave bikin?**

Erê, ev yek ji girîngtirîn xalên îdeolojîk û stratejîk e ku di çarçoveya neteweya demokratîk de weke projeyek siyasî û felsefî hatiye bilindkirin. Dema ku Ocalan behsa "terkkirina netew-dewlet û stratejiya şer" dike, ev ne tenê tê wateya rawestandina şer an gihîştina agirbestê. Belê, ew tê wateya guhertineke radîkal di pêkhateya ramana siyasî, hêz û nîzama civakî ya li Tirkiye û herêmê bi giştî.

Li vir em dipirsin: Li gorî Ocalan wateya dewleta netewe çi ye? Li gorî xwendina me ya vê projeya pêşeng a siyasî û felsefî, mirov dikare bibêje ku "netew-dewlet li gorî Ocalan ne tenê pêkhateyek îdarî ye, lê modelek otorîter a yekalî ye ku yek nasname û yek çandê li ser civakek cihêreng ferz dike." Wî ev yek weke ku zordestî û asîmîlasyona çandî (bi taybetî li dijî kurd û kêmneteweyan) çêdike, piralîbûnê red dike, cudahiyan ji holê radike, cihêkarî û şîdeta pêkhatî dixwe, û li ser bingeha navendîbûna zêde ya ku beşdariya civakê ya rastîn qebûl nake, bi nav kir.

Em jî dipirsin: Wateya "stratejiya şer" çi ye? Li vir mirov dikare bibêje ku siyaseta dewleta Tirk e ji bo çareserkirina "pirsgirêka Kurdan" bi zextên leşkerî û çewisandina ewlehiyê, krîmînalîzekirina tevgerên siyasî yên kurdan û sepandina dorpêçê li ser ramana azad, ji bilî paşguhkirina daxwazên rewa yên nasname, ziman û nûnertiya siyasî.

Di ronahiya vê yekê de, Ocalan di wê baweriyê de ye ku ev stratejî negihîştiye aştî û ewlehiyê, hîz zêdetir çerxeke xwînî ya tundî, tolhildan û înkarê derxistiye holê. Ji bo têgihîştina bêtir, em pirsek din dikin: Wateya "terkkirina netew-dewlet û stratejiya şer" çi ye? Di vê yekê de em dibêjin ku wate ne tunekirina dewletê ye, belkî veguherandina modela wê ya neteweyî ya navendî bo modeleke demokratîk a piralî ye. Ji ber vê yekê Ocalan banga derbasbûna pergala neteweya demokratîk wekî têgehek navendî dike ku li ser bingeha rêvebirina civakan, rêzgirtina cihêrengiya çandî, olî û etnîkî, tevlêkirina hemî pêkhateyan di biryargirtinê de bêyî hewcedariya veqetandinê, û avakirina civakê li ser bingeha edaleta civakî, azadiya jîngehê û wekheviya her du zayendan.

Ocalan her wiha banga guhertina şer bi diyalogê dike ku li ser bingeha hevdu naskirinê, danûstandina bi rêya çareseriyên siyasî, azadkirina girtiyên siyasî, rakirina qedexeya li ser tevgerên siyasî, û piştre nivîsandina destûrek nû ku nasnameya piralî û hevkariyek rastîn di rêveberiyê de nîşan dide.

Li ser vê têgihiştinê, Ocalan derbasbûna vê qonaxê wekî "serkeftin" pênase dike. Ocalan çima vê yekê wekî serkeftinek dibîne, li gorî têgihîştina me ya felsefeya Ocalan, em dibêjin ku ji ber ew di wê baweriyê de ye ku serkeftina rastîn ne di serketina şerê bi çekan de ye, lê di bidawîkirina şîdeta pêkhatî de, şikandina zihniyeta hişk a neteweyî, azadkirina gel ji tirs û înkarê, û avakirina civakek azad ku her kes tê de beşdar dibe de ye ku bê zordarî û biçûkxistin. Ji ber vê yekê, ew veguhertina qonaxa diyalog û aştiyê ne paşvekişîn, lê ji bo gelên kurd û tirk "serkeftineke şaristanî û dîrokî" dibîne.

Bi giştî Ocalan ne tenê daxwaza çareseriyeke siyasî dike, lê belê banga şoreşeke hişmendî û rewşenbîriyê li dijî modelên kevneşop a netewe-dewletê dike ku zilm û şeran çêdike û alternatîfeke demokratîk a tevlîbûnê ku her kes bi azadî û wekhev tê de dijî, pêşniyar dike.



# Herêmên Rêveberiya Xweser bûye qubleya ewle ya gelên Sûriyê

**Hevserokê Ofîsa Têkiliyên Giştî ya PYD'ê Silêman Ereb da zanîn ku siyaseta qirkirinê û şerê mezhebî di Sûriyê de ne nû ye, hikumeta veguhêz a Şamê jî berdewamiya wê ye û got: "Gel gihişte wê baweriyê ku cihê herî bi ewle di Sûriyê de, Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye."**

**Zana Roj/Qamişlo**

Komkujî û siyaseta qirkirnê ya ku di demên dawiyê de li ser mezheb û pêkhateyên di Sûriyê de têne meşandin, siyaseteke dijmirovî bû. Di encama vê yekê de jî gelek malbatên Elewî, Durzî û Xiristiyan berê xwe dan Herêma Rêveberbiya Xweser li Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Têkildarî vê mijarê Hevserokê Ofîsa Têkiliyên Giştî ya PYD'ê Silêman Ereb bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû.

**Qirkirineke etnîkî û mezhebî ya sîstematîk li ser pêkhateyên Sûriyê tê meşandin. Her çendî Hikumeta veguhêz ya Şamê xwe ji van komkujiyan bê sûc digre, lê di esta yekemîn de ew berpirsyare. Gelo hûn helwesta hikumeta veguhêz a Şamê çawe dinirxînin?**

Siyaseta qirkirinê ya ku li ser pêkhate û baweriyan tê meşandin, ji dema rêjîma Baas ve dihate meşandin. Em bala xwe bidinê bi rêya siyasetên tayebt yên weke înkarkirina çand, ziman û hebûna gelan, her wiha ferzkirina Kemera Erebî li ser herêmên Kurdan û koçberkirina gelan. Ev yek bi riya siyasetên tunekirin û qirkirina gel û pêkhateyan di Sûriyê de dihate meşandin. Dewletên herêmî û navnetewî di nava vê pilanê de cihê xwe digrin û niha jî piştgiriya wê di Rojhilata Navîn de tê kirin. Îro desthilata nû ya Şamê bi itîfaqekî bi van dewletan re, dibe sedema komkujî û qirkirinên mezhebî û etnîkî ya gelên Sûriyê. Ev yek jî bi zanebûn û bi pilan tê kirin. Bi taybet komkujiyên li ser Elewiyan, bi vê hişmendiyê hate meşandin. Desthilata Şamê tu carî nikare xwe ji van kiryar û sûcan dur bigre. Komên çeteyan bi deh hezaran însan tunekirin û ew jî di bin serweriya wan de tevdigerin. Eger gotine em ê komîteyên çavdêriyê avabikin û lêpirsîn bikin, lê heyanî neha ne şopandin hatiye çêkirin, ne jî encamek ji vê yekê heyanî neha derketiye.

Heta niha jî ev hişmendî berdewamiya siyaseta dewlet-netewe û li ser gelê Kurd, Durzî, Elewî û Suryan bi rengekî rêk û pêk tê meşandin. Hikumeta Şamê ya veuhêz bi hemû kiryarên xwe û bi Sistema xwe ya navendî dibe sedem ku Sûriyê parçebibe. Destûr saz dike û cih nade ku pêkhate cihê xwe têde bigrin û ji derveyî xew tu kesî napejirîne. Bê guman ev zihniyet zihniyeta qirkirina gelan e, ger ev yek berdewambike wê rewşa sûriyê ber bi kûve biçe nediyare û wê şerê navxueyî rûbide.

**Gelê Elewî, Durzî û Xiristiyan, berê xwe dane herêmên Rêveberiya Xweser; ev jî nîşaneya wê yekê ye ku herêma herî bi ewle ev herême. Hûn Projeya Neteweya Demokratîk ji bo hemû Sûriyê û pêkhateyan çawa digrin dest?**

Di pêvajoya 14 salên derbasbûyê de her tim gelên ku ji ber şer mecbûr diman ku berê xwe bidin herêmên Rêveberiya Xweser û ew ji xwe re weke cihê herî bi ewle didîtin. Mînakên wê jî pir diyar in ji wan; dema şerê DAIŞ'ê, şerê rêjîma Bass û opozisyonê, şerê bi dagirkeriya tirk re çêdibû. Gel bi van şeran re gihişt wê baweriyê ku cihê herî bi ewle ku têde xwedî li gelan û mirovahiyê tê kirin, herêmên Rêveberiya Xweser e. Ji ber li vir sîstemeke demokratîk heye, rêveberiyeke ku hemû gelan di nava xwe de qebûl dike û diparêze heye û heyanî niha jî wiha tê birêvebirin û naskirin. Ji ber vê yekê jî her kes berê xwe dide herêmên me. Li ser tevahiya gelê Sûriyê heman siyaset tê meşandin; ev yek di komkujiyên li ser Elewî, Durzî û Xiristiyan jî hatin meşandin heman yeke. Dibe ku dema rejîma baas hilweşiya û hikumeta veguhêz hat şûna wê, hêviya gel hebû ku



ewlehî û aramî li Sûriyê pêkwere. Lê berûvajî vê yekê tişta ku dihate hêvîkirin pêknehat û rewşa heyî xirabtir bû.

**Bi geşedanên dawiyê yên ku li Sûriyê rûdidin dîsa heman yek tê meşandin. Gelo Hikumeta nû bi vê nêzîkatiyê wê çawa bikaribe hemû pêkhateyan hembêz bike û çareserî wê çawa pêkan bibe?**

Hikumeta veguhêz ya Şamê bi vê terz û hişmendiya xwe nikare hemû gelên Sûriyê di nava xwe de bihewîne û temsîla gelê Sûriyê bike. Dibe ku niha bi şêwazekî ji şêwazan li Şamê cihê xwe çêkiriye, lê di rastiyê de serweriya wan li ser piraniya Sûriyê nîne. Li herêmên Beravê Elewî, li herêmên Başûr weke Siwêda û Deraa durzî vê sîstemê qebûl nakin, her wiha li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê lihevkirin û danûstandin pêkhatin û ev siyaset cihê çareseriya bingehîn ji bona hemû pirsgirêkên tevahiya Sûriyê ye.

Ji ber wê pêwîste hikumeta şamê ya veguhêz li xwe vegere û sîstemeke ku hemû pêkhat, mezheb û civak tê de werin qebûlkirin esas bigre. Bi taybet her kes beşdarî avakirina Sûriya nû bibe. Em vê Projeya Netewa Demokratî ya rêveberiya Xweser ji bo avakirina Sûriyeke demokratîk, ne navendî kar dikin û pêwîste her kes di avakirina wê de beşdar bibe. Êdî gav û piratîkên ku li Şamê tên kirin nayên qebûlkirin, gelek giringe ku Sûriyê ji vir û pê de bê parastin. Ger wiha nebe wê gelê Sûriyê careke din temenê vê yekê bide.

**Tevî dewama komkujiyên desthilata Şamê li dijî pêkhateyên Sûriyê, dewlet û aliyên navneteweyî têkiliyên xwe pê re xurt dikin û çavên xwe ji kiryarên wê digirin. Hûn van nêzîkatiyan çawa şîrove dikin?**

Netewên Yekbûyî, Hêzên Hegemon yên cîhanî ji bo nêzîkatiyên hikumeta veguhêz ya şamê gotin ku wê çavdêriyê li ser desthilata nû bikin, lê xuyaye ku çavdêriya wan ne di asta ku tê xwestin de bû. Heger bibînin ku çawa sîstemeke tund, tenê yek rengî diparêse bi mejiyekî nijadpereste û olpereste dixwazin hikumet, perlaman û destûrekî nû avabikin. Gelek caran jî gotin ku divê mafê hemû pêkhateyan di Sûriye nû de bê parastin. Bi rastî jî ev gotin gelê Sûriyê ji bîr nekiriye. Pêwîst e ew çavdêrî û helwestên heyî yên gelê Sûriyê bi giştî bibînin. Ji bo wê heger ew çavê xwe digrin ew pirsgirêka herî mezin û bi xeter e ku berê Sûriyê ber bi alûziyeke mestir ve dibin.

Divê zext li ser hikumeta Şamê ya veguhêz bê kirin ku her kes di nava sîstemeke guncaw de hevdu qebûl bikin û bi hev re jiyan bikin. Her wiha modêla Rêveberiya Xweser li Bakur û rojhilatê Sûiyê, sîstema ku hatiye avakirin û Hevpeymana Civakî modêla herî rast û guncaw a avakirin û birêvebirina Sûriyê ye.



# Ji bo bîranîna Berxwedêrên 14'ê Tîrmehê

**Arîn Koçer**

Di destpêkê de em di şexsê şehîdên berxwedana 14'ê Tîrmehê de yên bedena xwe ji bo gelan helandin li hember şehîdên azadiyê bejna xwe ditewînin. 14'ê Tîrmehê di dîroka gelê Kurd de deriyeke mîna bihuştê ji gelan re vekir. Ji ber dijminê bav û kalan her tim gelê Kurd dipelçiqandin û digotin, Kurdistana xeyalî li vir binaxkirî ye." Dixwestin Kurdan di nava dojehê de 'terbiye' bikin. Wan hevalan li dijî înkar û imhaya Kurd û Kurdistanê serî li beramberî dijminê qirkerakirin û mîraseyeke berxwedanê ji me re hiştin. Bi sekna xwe ya bi heybet di nava gelan de baweriya bi serkeftinê ava kirin û ruhê rêhevaltiyeke herî rast dan diyarkirin.

Bi mîras û têkoşîna wan hevalan me xwe bi çek û rext kir. Me xwest rûmetbilindiya wan heya lûtkeyên çiyayên asê belav bikin. Di kesayeta wan hevalan de me xwest em bi çand û hevaltiya wan xwe perwerde bikin û pratîze bikin.

Berxwedêrên 14'ê Tîrmehê beriya bikevin girtîgehê de jî bi sekn û xebatên xwe di nava Tevgera Azadiyê de mînakên herî berbiçav bûn. Bi uslûb û terzên xwe mînakên berbiçav bûn. Di zindanê de dijmin dixwest îradeya wan bişkîne û wan teslîm bigire. Lê wan hevrêyan bi dirûşma "Berxwedan Jiyan e" bersiveke herî mezin bi ruhê Apocîtîyê raber kirin.

Li dijî êrîşên bê exlaqî û der mirovî, li hember ferzkirina teslîmiyetê wan hevalan berxwedaneke ku wê zêdetirî 50 salî bidome û serkeftinan qezenc bike pêş xistin. Em dikarin bêjin ku bi sekn û berxwedana wan hevalên şehîd em xwe bi rêxistin dikin û pêş bixin. Em her tim kesayeta wan ji xwe re mînak digirin.

Em wekî gel û tevger jî deyndarên wan hevalan e. Wan şehîdên mezin ji bo azadiya gelan bedena xwe helandin. Mizgîniya yekîtî û hevgirtina gelan şehadeta xwe diyarî mirovahiyê kirin. Di hindirê zindanê de jî gelek kadroyên PKK'ê û welatparêz ji têkoşîn û kesayeta van hevalan bandor dibin û xeta berxwedanê esas digirin.

Ji bo em xeyalên wan hevalan pêk bînîn pêwîst e em keramet û fedakariya wan bikin bingehê civakeke komînal û demokratik.



Em wekî şoreşger û milîtan soza xwe dubare dikin ku heya dawiyê li pey şopa wan bin. Heya avakirina civaka demokratîk, komînal û sosyalîst em ê têkoşîna xwe li ser esasê fikir û bîrdoziya Rêber Apo pêş bixin.



# 'Berxwedana 14'ê Tîrmehê hîmê têkbirina faşîzmê ye'

**Yek ji berxwedêrên girtîgehên dewleta Tirk Kamuran Efrîn da xuyakirin ku ruhê 14'ê Tîrmehê Şoreşa 19'ê Tîrmehê ava kir û wiha got: "Berxwedaniya bêhempa ya Rêber Apo li Girava Îmraliyê domandina berxwedana Xeyrî û Kemalan bû."**

**Argêş Vîyan/Qamişlo**

Berî niha bi 42 salî li Zîndana Amedê li dijî koletî, radestbûn û xiyanetê; berxwedan dilsozî û azadî bi pêşengtiya lehengê mezin Mezlûm Dogan agirê Newrozê hat pêxistin. Li dijî siyaseta teslîmgerî û xiyanetê berxwedana zindanê bi serket û berxwedana 14'ê Tîrmeha 1982'an giha asta herî bilind. Ji bo ku li Tirkiyê, bi taybet li Bakurê Kurdistanê tevgera şoreşgerî were astengkirin û fetisandin, di 12'ê Îlona sala 1980'yan de generalê faşîst ê dewleta Tirk Kenan Evren darbeyek leşkerî kir û desthilatê xist destê xwe de. Rejîma faşîst a 12'ê Îlonê bi vê derbeyê dest bi şantajê kir û girtîgehan bi şoreşger, azadîxwaz, demokrasîxwazan tejî kir. Di beramberî vê derbeya reş, tenê ciwanên Apoyî biryara berxwedanê dan.

Di derbarê berxwedana 14'ê Tîrmehê ya li girtîgeha Amedê yek ji girtiyê 30 salan û şoreşger Kamuran Efrîn ji rojnameya me re axivî.

**'Berxwedan 14'ê Tîrmehê hemberî berdewamiya politikayên qirkirinê dest pê kir'**

Yek jî girtiyên 30 salan yê ku girtigehên Tirkiyê de ma bû Kamûran Efrîn anî li ser ziman ku 14'ê Tirmehê gelê Kurd ji qirkirinê xilas kir û wiha dest bi axaftina xwe kir: "Di sala 14'ê Tîrmeha 1983'an de di hemberî polîttîkayên qirkirinê yên faşîstane yên hikûmeta Tirk û di heman demê



de jî fermandarê girtîgeha Amedê yê wê demê Esat Oktay Yildiran dan destpêkirin. Ev ne tenê rojiyekê mirinê bû, berxwedaniyekê bê hempa ya xilaskirina gelekê ji pencê qirkirinê bû. Rihê ku azadiyê bêpar hatibûn hiştin nûve ronî kirin. Berxwederên 14'ê Tirmehê Elî Çîçek, Kemal Pîr, Xeyrî Dûrmûş û Akîf Yilmaz bi rêzdarî bibîrtinim. Xeyrî û Kemal bi rihê xwe yên ku çîroskên berxwedanê, li hemberî hemû polîtîkayên ku gel û civakekî tine di hesibandin serî rakirin. Kemal Pîr, Hayrî Durmuş, Akîf Yılmaz û Alî Çîçek bi çalakiya rojiya mirinê re, li hemberî îşkence û qirkirina kurdan bi vîn û baweriyeke mezin bedenên xwe danîn li ber agirê û bûn sembolên berxwedanê. Bi berxwedana zindana Amedê tevgera azadiya gelê kurd jî biryara berxwedanê da. Tevî êşkenceyên giran ên li ser kadro û alîgirên PKK'ê dihatin pêkanîn, bi armanca sînordarkirina hovîtiya rejîmê, bidestxistina mafê berevaniya siyasî û çêkirina şert û mercan, di meha Adara sala 1981'an de hejmarek zêde ya kadro û pêşengên PKK'ê, di nav zîndana Amedê de çalakiya greva birçîbûnê destpêkirin. Di roja 43'an a çalakiyê de, Berpirsyarê Girtîgeha Amedê neçar dibe li gel Nûnerê çalakvanan Kemal Pîr birûne û soza pejirandina doz û daxwazên wan dide. Bi vî şêweyî dawî li çalakiya greva birçîbûnê tînin.Rêber Apo ji bo berxwedanê dibêje; me bi şerê çekdarî bersiv da berxwedanê. Ger îro li ser kiryarên Tirkiye yên 12 Îlonê lêpirsîn dabin destpêkirin û herkes wek demek reş wan rojan dibîne, ev bi saya berxwedana zîndana Amedê ye. Dema ku Xeyrî Dûrmûş di got em deyndarê wî gelê ne, ev bi rihê berxweder rojên îro ku Rêber Apo pêşengtiya wê dikin afirandin û bûn rêberê têkoşîna azadiyê. Di roja 55'an a rojiya mirinê de, Kemal Pîr tevlî karwanên şehîdan dibe. Her wiha Mihemed Xeyrî Durmuş piştî 58 rojan, Akîf Yilmaz piştî 66 rojan û Elî Çîçek jî piştî 67 rojan di çalakiya rojiya mirinê de şehîd bûn."

**'Bi rihê 14'ê Tirmehê 19'ê Tîrmehê afirandin'**

Kamuran da xuyakirin ku rihê 14'ê Tîrmehê şerkirin dîrok avakir û wiha domand: "Bi rihê 14'ê Tîrmehê berxwedaniya keş û xortên kurdan, li Zap, Metîna Xakurkê û Heftanînê gehişte lutkeya bilind ya serkeftin ê. Li ser rihê berxwedana 14'ê Tîrmehê hîmê şoreşa 19'ê Tîrmehê hat danîn. Bi rihê komînal û enternasyonal berxwedan hat meşandin û pergala Rêveberiya Xweser hat avakirin. Bi mîrateya Mazlum, Kemal û Xeyriyan Karker, Gelhat û Arînan şer kir û çeteyên how û qirker têkbirin. Ev rihê ku tên qalkirin bi berxwedaniya 14'ê Tîrmehê da avakirin. Em çi qasî xwedî deskeftiyên şoreşa Rojava derbikevin û biparêzin, ew qasî xwedîyê berxwedana 14'ê Tîrmehê derdikevin. Ji ber ku ev ked û xebat hemû mîretaya wan û saya berxwedaniya 27 salan ya Îmraliyê ya Rêberê Gelan Rêber Apo ye. Ew rih li Bendava Tişrînê, heya Kobanê xwe dida pêş.."

**'Têkoşîna bê hempa ya girtîgeha Îmraliyê, berxwedana 14'ê Tîrmehê nûjen kir'**

Kamuran bibîrxist ku rola Imraliyê ya berxwedana gîrtgeha û têkoşîna 27 salan silav kir û wiha qedand: "Ew serkeftin û deskeftiyên ku tên avakirin û bi dest xistin hemû bi saya Rêber Apo û berxwedaniya girava Imraliyê ya 27 salan e. Ji ber ku Rêber Apo girtîgeha Îmraliyê veguherand pirtûkxane û dîrokxaneyekê pir mezin. Di nav tecrîd û zextekê pir mezin de, gelê Kurd û herêmê ji pencên qirkirinê xêlas kir. Xeyriya xwe deyndarê gel dît, em jî xwe deyndarê ramanên Rêber Apo û Xeyrî û Kemalan dîbinîn. Dîsa dubare dikim ku em ê rêça berxwedaniya 14'ê TÎrmehê, bi rihê 19'ê Tîrmehê xurt bikin û pêvajoya Rêber Apo heya bikeve serkeftinê em ê xebat bikin. Li ser wê bingehê em silavên xwe yê xurt ji bona Rêber Apo û berxwederên hemû gîrtegehan de dişînin."

## Gelo Sûriyê careke din dê bikeve bin bandora rêjîmeke otorîter?



**Zekî Bedran**

Lihevkirinek di navbera QSD'ê û rêveberiya Şamê de pêk hat. Ji dema îmzekirina peymanê di meha Adarê de ve, ti pêşveçûnek berbiçav û ya girîng çênebûye. Li Helebê pêşketinek heya erdekê çêbû. Paşê, desteyên danûstandinê ji bo bicîhanîna peymanê hatin avakirin. Ev deste li Şamê civiyan û li ser çawaniya xebatên xwe nîqaş kirin. Lê, deste careke din necivîn. Diviya bû komîteyên jêr werin avakirin û di nav xwe de li ser hin mijaran nîqaş bikin. Lê, li ser vê mijarê ti pêşveçûn an nîqaş çênebû. Di dawiyê de, şandeyên ji Şam û Rêveberiya Xweser bi navbeynkariya nûnerên Dewletên Yekbûyî û Fransayê civiyan. DYA û Fransayê hewl dan ku rê li ber pêvajoya rawestiyayî vekin û piştrast bikin ku alî li ser hin mijaran gav bavêjin. Lê belê, ev civîn jî bê encam derket. Wekî din, nûnerê DYA Thomas Barrack kiryarên ku pirsgirêkê hîn girantir kirin, ew veguherandin aloziyekê, û daxuyaniyên pir neyînî ji raya giştî re dan. T. Barrack kesekî xwedî ezmûn e. Ew wekî navbeynkar tevdigerin, aliyan tînin cem hev. Divê ew fêm bike ku alî pir dûrî hev in. Ger aliyek pirsgirêkek pêş bixe û nêzîkatiyek teng bigire, divê Barrack bikaribe li hev bike û aramî pêk bîn e. Lê ev ne wisa bûye. Daxuyaniya Barrack bi retorîk û siyaseta DYA ya heta niha re nakok e. Ew dibêje, "Em ê ji bo QSD'ê dewletek ava nekin, em nikarin wan bişopînin; rêyên din hene. QSD, YPG û PKK yek in, hwd." Dewleta Tirkiyeyê bi salan e vê îdiayê dike. Wê DYA bi hevkariya bi terorê re tawanbar kiriye û salan e, zext lê dik e.

Wezîrê Derve yê Rûsyayê Sergey Lavrov kesayetiyek din bû ku DYA tawanbar kir û rejîma Sûriyê û dewleta Tirkiyeyê provoke kir. Carinan digot, "DYA dê Kurdan neçar bike ku dewletek ava bikin." Lê dîsa jî, ew ji daxwazên Kurdan baş agahdar bû. Kurdan daxwazên xwe bi nivîskî ji hikûmeta Sûriyê û Rûsyayê re pêşkêş kiribûn. Wekî din, di daxuyaniyên pir caran de, wan diyar kir ku ew dewletekê navendî û netew naxwazin. Ev nêzîkatî bi eşkereyî xizmetê ji çareseriyê re nake. Ew ne tenê aliyan teng dike, lê di heman demê de gefê li Kurdan jî dixwe. Lavrov ji Kurdan re digot ku dev ji maf û daxwazên xwe yên ji bo Rêveberiya Xweser berdin û tevlî rejîma Baas bibin. Niha nûnerê taybet ê DYA jî heman tiştî dibêje. Balkêş e ku ew ji Rêveberiya Xweser re, ku li Rojhilata Navîn demokrasiyê dixwaze û di vî warî de mînakek baş dide, dibêje ku dev ji van berdin. Ew dibêje Sûriye dewletek e, hikûmetek navendî dê hey e, û divê em tevlî wê bibin. Kes nabêje ku em ji Sûriyê derkevin an artêşek cuda hebe. Lê ev Sûriya navendî û zordar bûye sedema şerekî navxweyî yê dijwar û wêraniyê. Hebûna gel hate înkarkirin. Serweriya zagonî nexebitî, û maf û azadî ji bo gel pir zêde hatin hesibandin. Tawanên giran ên li dijî mirovahiyê hatin kirin. Hilweşîna vê rejîmê ji bo gelê Sûriyê derfetek mezin e. Niha, divê Sûriyekî nû li ser bingehek demokratîk were avakirin, û maf û azadî divê werin teqezîkirin.

Hebûna HTŞ'ê di desthilatdariyê de ji bo demokrasiyê kêmasiyekê mezin e. Ew behsa têgeha demokrasiyê jî nakin. Ew li dijî wê ne. Tewa di demekê de ku ew nikarin Sûriyeyê serwer bibin û qels in, ew rêveberiyek pir navendî ferz dikin.. DYA û Ewropa bi Sûriyê re eleqedar in. Wan bi HTŞ re peywendî pêş xistine. Wan ambargo rakiriye. DYA û hevkarên wê jî bandorek xurt li ser welatên Ereban dikin. Îsraîlê diyar kiriye ku ew dewletek an hikûmetek li ser bingeha bingehên olî li kêleka xwe naxwaze. Ew heta saziyên leşkerî yên mayî bombebaran dike. Ew heta ber bi Şamê ve çûye û hêzên leşkerî bicîh kiriye. Ger DYA û hevalbendên wê nexwazin ku HTŞ'ê ji bo herêmê bibe gef, divê ew beşdarî avakirina Sûriyekî demokratîk bibin. Sûriyekî piralî û demokratîk dê hem li hundir û hem jî li navneteweyî nebe gef. Ew kesên xwedî raman û daxwazên cuda na pejirînin nav hikûmetê, û wan di pêvajoya çêkirina destûrê de jî nagirin di nav xwe de. Ew hewl didin ku dewletê li gorî hişmendiya xwe yên yek dest, zêde navendî û takekes birêve bibin û ava bikin. DYA û Ewropa bi Sûriyê re eleqedar in. Wisa xuya dike ku DYA û welatên Ewropî xema demokratîkbûna Sûriyê nakin. Ew berjewendiyên xwe yên teng didin pêşiyê. Wekî din, T. Barrack dê ji bo Sûriyekî pir navendî di bin desthilatiya HTŞ de piştgirî neke, û ev dê ji bo vê yekê nebe çavkaniyek aloziyê. Kurdên li Sûriyê demokrasiyê diparêzin. Wan li herêmên xweser hikûmetek demokratîk ava kirine. Wan mînakek baş dan ku deh sal in li ser piyan e û ji bo cîhanê vekirî ye. Kurd alîgirê hikûmetek piralî,demokrat re piştgrî dikin. Ji aliyê din ve, HTŞ li dawiya dijberî ya vê buyerê ye. Ew ti daxwaz an nêrînên wekî azadiya jinan nayinin li ser ziman jî. Berevajî vê, ew dixwazin jinan di malên wan de bihêlin. Ew li dijî azadiya ramanê, rêzgirtina ji bo ol û baweriyên cûda, û hikûmetek pirçandî ne. Ewqas ku wan navê "Komara Erebî ya Sûriyê", ku mîrateyek Baasê ye, di destûra xwe de bi cih kir. Bê guman, anîna cem hev a nêrînên cîhanî û birdoziyên wiha cihêreng û gihîştina lihevkirinê ne hêsan e. Lê heke DYA û Ewropa li ser demokrasiyê û hebûna azad a gelê xwe israr bikin, ew dikarin hikûmeta Sûriyê neçar bikin ku gavan bavêje. T. Barrack, erkê wan ew e ku çareseriyê ber bi bingehek demokratîk ve bibin. Wekî din, Kurdan daxwaza dewletekê tine ye. Ne hewce ye ku pirsgirêkan tevlihev bikin an jî dijwar bikin…..



## Dewra Nû

Farûk Sakik

Di van salên dawî de dema ku li Îmrali li ser Rêber Apo tecrîd hebû û Kurd rojên dijwar dijiyan, herkesî digot, heger Rêber Apo di tecrîdê de nebûya sedî sed rêyek ji bo pêşî li doza Kurdistan veke, wê bidîta. Di dawiya sala 2024'an de dema Omer Ocalan û desteya Îmrali çûne hevdîtinê, êdî Kurdan bawerî pê anîn ku doza Kurdistan wê derbasî qonaxeke nû bibe.

Piştî van hevdîtinan, di têkoşîna Kurdan de çar merhale-dîmenên dîrokî derketin pêş.

1- Di 27'ê sibatê de Rêber Apo banga aştî û civaka demokratîk kir.

2- Di 5-7'ê Gulanê de PKK'ê kongreya xwe ya 12'emîn li dar xist. Di kongrê de partî hat fesixkirin û biryara dawî anîna şerê çekdarî hat dayin.

3- Di 9'ê Tîrmehêde vîdeoyek hat parvekirin, piştî dem û salên dirêj yekem car bû dîmen û dengê Rêber Apo hat dîtin û bihîstin. Di peyame xwe waha digot; Tevgera PKK'ê ya xwe dispart bidawîkirina înkara hebûnê û avakirina dewleteke cuda, stratejiya şerê rizgariya netewî hatiye bidawîkirin. Hebûn hate naskirin, lewma armanca sereke jî pêk hatiye. Ji ber vê mîada xwe temam kir.Û banga îmhakirina çekan hatibû kirin.

4- Di 11'ê Tîrmehê de gerîlayên azadiyê bersiv dane banga wî. Koma aştî û civaka demokratîk bi merasimek sembolîk çekê xwe şewitandin.

Di 9'ê Tîrmehê de deman dengê Rêber Apo û dîmenên wî dîtin li her deverî şahî û pîrozbahî hebûn. Kurdan ji bo azadiya wî û ji bo tecrîd bi dawî bibe, têkoşînek bê emsal dabûn. Ewroj encamên têkoşîna xwe pîroz dikirin.

Di 11'ê Tîrmehê de di merasima îmha kirina çekan de xemginî hebû. Raste digotin şer bi dawî dibe û êdî çekan doza Kurdistan aniye merhaleyek nû. Lê dîsa jî dîmenên şewitandinû ew xemgîn kiribûn.

Ji bo Kurdan gerîla û çek du têgehên pîroz in. Gelek caran çalakiyên fedayî hatin lidarxistin. Roj dihat ji bo rewşa kambax berevajî bikin xwe jî di şewitandin. Wek li zîndana Amedê di 18'ê Gulana 1982'yan de. Wek şeva çaran. Li dijî zilma dijmin bi agirê bedenê xwe pêngavek berxwedanê dabûn destpêkirin. Kurd bi çalakiyê serbilindkêfxweş dibûn, lê bi şahadetan jî xemgîn dibûn.

Di 11'ê Tîrmehê de heman atmosfer hebû. Çek, hebûna Kurdan dabû îspatkirin. Çek, têkoşîna Kurdan meşrû dabû nîşandan. Li gor konjoktore demê êdî derbasî siyaseta demokratîk dibûn. Kî çi dibêje bila bibêje ew merasim, bi serê xwe encamê şerê wan nîşan di da. Meşa wan, sekna wan, rêzgirtina wan ya li hember çekê ji bo Kurdan serbilindî bû. Çek teslîm nekiribûn şewitandibûn.

Ew merasim, ew agirê li wêder bilindibû, dora rojê di 12'ê Tîrmehê de, bi Erdogan dida îtirafkirin ku 41 sal e nikaribûne vê tevgerê, vê çekî têkbibin. Bi dewletê dane îtiraf kirin ku li hember Kurdan zilmek çawa hatî kirin. Îroj Îtiraf dikin ku Kurd neçar mane ku serî li vê çekê dane. Ev çek bi têkoşîna xwe anî radeyek bi Rêber Apo re ji bo demokratîkbûna Tirkiyê muzekereyan bidin destpê kirin. Û bi vê merasima çek îmhakirinê jî dane qebûl kirin ew çek, wek Rêber Apo gotî mîada xwe temam kiriye.

Bala we kişandibe îroj di çapameniya Tirkiyê ya ku parçeyê şerê taybet jî nikare bibêje PKK têk çû. Di rojên pêş de em ji gelek pêşketinan re şahidî bikin. Raste di nav civakê de nêrînek heye dibêje, bextê romê tuneye. Evcar vê gotinê nabêje. Dibêje ew bêbextî bikin jî Rêber Apo yê destûr nedê vê yekê.